Sal 1 — Hejmar 21

Duşemb 20 Îlon 1943

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

# ROJA NÛ

Dîwan û gerînendekariya Rojnamê: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

CENG & SIYASET

## DEWRAN

### Teklîfên Japona

Weşington—R: Duhî di civana rajnamevanan de wezîrê çînê ê dervekariyê gotiye: japona silh teklîfî me dikin, û di vê babetê de hero hêj comerdtir dibin, wan gotiye: heke hikûmeta çînî bû Hevalbendê me, emê eskerên xwe ji erdê Çînê bi şûnda bikişînin.

### Bilxaristan

Nû-York—R: Nûçegihayê Asosiyeted Presê dide zanîn; Gerînendeyên Taca Bilxaristanê gotine elemana ko leşkerên Bilxaristanê heke Ordiyên ingilîz û emerîkanî derketine Ewripa Nîroyî şerî wan bikin, lê heke Ûris şerî wan hatine Bilxaristanê, Ordiya bilxarî şerî ûrisa na ke.

### Xesarên Emerîkanî

Weşington—R: Ji destpêka şerî û heta niha 102.573 eskerên emerîkanî ji qiwet ketine: 19.721 kuştî, 26.765 brîndar, 32.157 winda bûyî, 23.935 hêsîr.

### Ordiya Sor

MOSKÛ — Ordiya Sor di sê deran de serfiraz bû ye:

1—Ketiye erdê piştçeperên elemana — di dûrahiya sed kilomêtrande - li roavayê Tagenrogê û di pêşiya Qrimê de bendera mezin î hêjatir Mariopol standiye.

2— Di nîro—roavayê Xarkovê de, wê baskê eniya elemanî, ya erdê Xarkovê neqeb kiriye, zora dijmina biriye, her çend ji li vê derê, pêdana leşkerên elemanî, ji her derên din xurtir bû; û Barvenkovo vegirtiye, bajarê ko li ser nîvê riya Slaviansk û Lozovayê de avakirî ye, Rêhesina Donbaz—Kiyevê, di vî şaristanî re dibore.

### Ordiya Sor

3—Du gelînekên rêhesinan ên giranê Volnovaxa û Şapinoyê xistine destê xwe, ev gehinekên he hikmî dora erdên pira Dniepr — Zaporoj û yên Dniepr — Petrovskayê dikin.

Di eniya Smolensk—Behra Azovê de, milyonek eskerên elemanî xwe bi şûnda dikişînin.

### Teymis Dibêje:

Londre—R: Rojnama Ingilîzî Teymis qala şerê ko der erdê Italyayê, di nav bira eleman û Hevalbendan de çêdibe dike û dinivîse:

Elemana haziriya xwe kirine û di erdê Italyayê de şerine zor çêbibin; qesda elemana ji vî tiştî dido ne: yek siyasî, a din eskerî.

Eleman dixwazin ji havalbendên xwe ên biçûk re, bidin seh kirin, ko bi dest ji şerî kişandinê, şer na qede, her wekî li Italyayê çêbûye; û ji aliyê din bêterefmayîn ji bona rahetiya miletekî, êdî, ne tu derman e, ev şer ji bona tiştine pak û bilind çêdibe, û di vî warê şerî de ji bona bêterefan cih nîne.

### Gotara Rozwelt

Serekcimhûr Rûzwelt roja înê

## STOLA TALYANÎ

### Sed wapor hatine Maltê

CEZAYIR — Ji sedî bêtir wapor û çengkeştiyên talyanî di Maltayê de li hev civiyane. Di nav wan de; 5 zirehpûş, 6 qriwazor, 2 qriwazorên sivik, qriwaxoreke arîkariyê, waporeke balafirhilgir, 19 noqav, 28 destriyor, 12 vedetên torpîlavêj, 6 korvet, waporeke nesax û brîndaran û yekîneyine behrî ên din hene.

## DI DONZDE GIRAVAN DE

### Şerine Zor û Xwîndar Çêdibin

LONDRE — Nûçegihayê Teymisê dide zanîn: der girava Rodosê, di nav bira eskerên talyan û elemanî de şerine gelek zor çêdibin. Di donzde giravan de 60.000 eskerên talyanî û 7,000 eskerên elemanî hene.

### Stola Dinyayê a Xurtir & Zeximtir

Weşington—R: Wezareta emerîkanî a behrî dide zanîn: Îro stola emerîkanî, stola dinyayê a xurtir e. Qiweta emerîkanî a behrê ji 14.072 waporan bi hevketî ye; 613 hebên wan çengeştî ne. Di destê behriya emerîkanî de 18.000 balafir hene.

## DER ENIYA PESIFIKÊ

MELBURN— Qerargeha Hevalbenda a mezin li Pesîfîka Nîro-Roavayî elam dide: ji balafirgehê pê ve, qiwetên Hevalbenda bender û bajarê Salamuayê,— Girava Nûgineyê — vegirtine. Japona zehf çek û posat hiştine. Qerargeha japanî a Laeyê, bi vegirtina Salamûaye ketiye tengiyeke giran.

Bombeavêjên emerîkanî ên giran di girava Kolam—Bangarayê de çeper û penahên japona yên Vilayê bombardiman kirine.

WEŞINGTON— Wezareta emerîkanî a behrî dide zanîn: li 23—ê tebaxê bombeavêjên dijmina di behra spî de 2 noqavên emerîkanî bin av kirine. Dîsa ev wezaret elam dide ko 15 balafirên japonî dirêjî qerargeha emerîkanî a Tunaputiyê kirine; xesar sivik in.

## SERFIRAZIYA ORDIYA SOR

### Pêşveçûna Leşkerên Rûsî Domdike

MOSKÛ—Hefta borî Ordiya Sor ji serfirayê çûye serfiraziyê, leşkerên elemanî di tevayiya eniyên şerî de 50 û heta 100 mîl xwe bi şûnda kişandine. Perîşaniya elemana ne maze di axa Donetzê û li ser riya Smolensk û ya Odesayê zehf giran e. Di nav deh rojên vê mehê ên pêşîn de erdê ko ji destê elemana hatiye standin, ji axa talyana mezintir e. Piştî serfiraziyên Orel—Bielgorod—Xarkovê ordiya sor 55 bajar û şaristan û 3,000 gund û avahîgeh vegirtine.

Li zehf deran elemana çek û posat û zad û zexîreyên xwe di cih de hiştine û baz dane.

Ordiya Sor di axa Ukrenyayê de, ji alîkî elemana bi şûnda dizivirîne û ji aliyê din gihaye dera ko ji Kievê, 30 mîl dûr e.

Pêşveçûna Ordiya Sor bi awakî hinde lez dom dike ko, ji elemanayê torpîla deynin erdê —her wekî adeta wan e— û bervehatina lekên rûsî hinik biewiqînin.

## REFA NORMANDI

### 61 Balafirên elemanî avêtine erdê

MOSKÛ — R: Refa frensizî Normandî di şerên hewayî ên dawîn de şêst û yek balafirên elemanî anîne xwar.

LA VALET— Destriyora Italyanî «Auguste Riboti» hatiye Maltayê

nameyek şiyandiye Qongrê—civatmiletê Emerîkanî—tê de hatiye gotin: Di Dema etlahiya civatmiletî de tiştine girane qewimîne û niho di erdê Ewrûpa û Asyayê de şerine mezin çêdibin.

Di nîroyê Napoliyê de, der navbira eskerên me û elemanan de qomandine xwîndar dest pê kirine, xesar dijwar in: Eleman bi çavsorî şer dikin û dizanin ko çek danîna talyana çi tiştekî giran ye û ji şûnmayiyên wê bûyerê hisaban dikin. Milet û civatmiletê emerîkanî, dikarin qanî bibin ko eskerên me ji Italyayê pê ve, wê derkevin erdine din. Me qerara vegirtina Erdê Talyana di Qezeblankayê de da bû, û me di civanê Kubekê de jî, qerarine din dane û li wê me sînorên qerarên xwe hêj firehtir kirine, û emê bi derbine giran zora xwe bidin Japon û Elemana.

Li 10—e hizêranê qomanda Sicilyayê destpê kir û ev şer di nav 38 rojan de qediya. Xesarên Hevalbenda 38.158 peya ne, têde 7.445 Emerîkanî hene. Zererên dijmina 165.000 in, têde 132.000 hêsîr hene.

Xelkê Italyayê bi şahî çûne pêrgîna eskerên me, û her çend ji talyan 21 sal barê zorkeriya fasizmê hilgirtine, hevîna azahî û serbestiyê di dilê wan de ne vemireye.

Hitler digot: keleha Ewrûpayê nikare bête standin: emê wextê xwe de pêş wî bikin ko ev gotin ne rast e. Ordiya Sor pêş ve dikeve; leşkerên rûsî dijmina ji welatê xwe wê derînin û erdê Germanistanê dê bêxin destê xwe.

Em dizanin ko miletên biçûk yên ko hevalkarê elemana ne mînakirî silh û aştiyê ne.

Xesarine dijwar wê bigehin me; lê emê zora neyaran bibin; û qiweta japona, piştî ko me ew kir ... û dûman wê bişkê.

### GENERAL PETIT

Moskû—R: Serekê kardariya frensizî a eskerî li Sovyetistanê General Petit duhî li saet 17 û nîvan de bi Mareşal Stalîn û M. Molov re dûr û dirêj peyiviye.

Cezayir—A.F.I Komîte frensizî a xelasiya Welêt îro li saet dehan civanek danî.

Cezayir—A.F.I. General Kole bûye fermandarê axa Fezê.

### GENERAL KATRÛ

Cezayir—A.F.I. General Katrû hatiye xatirxwaziya bajarê Cezayirê.

Nikosî— Heşt waporşerên talyanî hatine Qibrisê.

### GOTARA MUSOLINI

Rome— Duhî Musolînî di Radyoyê de peyiviye û gotiye: fesistan «Xwedî kirasên reş»!

Hon ji nû ve dengê min dibihîsin. Emrê Kralê Italyayê ez dam girtin. Lê min zanî bû ko Hitler mîna dest brayekî bi min mijûl bibe. Sihvanvanên elemanî ez ji hebsê xelas kirim. Kralê Italyayê bêbextî li Germanistanê kiriye, û dixwest min teslîmî dijminan bike

Êdî em nikarim qîma xwe bi Kral bînin, ji xwe miletê talyanî ji Kralîtiyê ne razî bû û tim û daim berberiya wê dikir.

Emê çekê xwe hilgirin û di tenişta elemana de şerê dijmina bikin. Bêbextiya ko hatiye nivîsandin rûpelên tarîxa Italyayê, bitenê bixwîn dikare bête şuştin.

### SIR STAFORD KRIPS

LONDRE— Sir Staford Krips, wezîrê çêkirina balafiran gotiye: Nabe ko emê xwe bi nûçeyên xweş bilorînin û destê xwe ê xebatosist bikin. Bihayê serfiraziyê giran e û şer ji dawiya xwe hêj dûr e.

Rome— Ejensa talyanî Stefanîdide zanîn: Mareşalê talyanî Ugo Kavalero, serekê şerdariya talyanî ê kevin xwe kuştiye; ew 63 salî bû. Berî bi çend rojan Berlînê da bû Zanîn ko elemana Kavalero ji hebsê derêxisti bûn.

## DANEZAN

Londre— Wezareta Brîtanî a hewayî dide zanîn: şevêçûyî bombeavêjên brîtanî, bi awakî gelek xurt dirêjî febrîqeyên Montlusonê yên qewçûkan kirine, 40 mîl bakur roavayê Vişiyê.

Ewr û dûman armanca winda dikirin, lêbelê raporên pêşîn didin zanîn ko bombeyên me ketine cih daxwazan. Di Germanistana bakur-roavayî de, hêjagehên elemana û payetextê wan Berlîn jî, hatine bombardiman kirin.

Nêçîrvanên me yên ko di ser erdê Frensê re, karê xwe ê nobetdarî û dîdevaniyê pêk dianîn, li balafirgehên dijmina û li kamyon û rêhesinên di wan xistine, û ba lafireke neyar pelixandine, 8 bom beavêj û 2 nêçîrvanên me venege riyane warên xwe.

Londre—Şevadî çend balafirên dijmin di ser axa Ingilîstanê re firiyane û bombe avêtine, hinik xesar heye, canê çend peyan êşiyaye; di ser Ingilîstanê re 3 û di ser Frensê re balafireke dijmin hatine xira kirin.

# DEMA NIHA

## TEVKARIYA HEVALBENDA

Serekcimhûr Rûzwelt, di gotara xwe a dawîn de gava qala Germanistanê dikir digot ko qerara Fmerîka li ser rakirina koka nazîzm û leşkerperestiya prûsî neguhêrbar e, û dinyayê divêt ji taluka wan her du belayên mezin bête xelas kirin. Cihgirtiyê serekcimhûr Mr. Welas û wezîrê emerîkanî ê dervekariyê Mr. Kordel Hal, di vê babetê de mîna Mr. Rûzwelt difikirin. Ji xwe nas e ko serekwezîr Çorçil û wezîrê brîtanî ê dervekariyê Mr. Îdin jî, vê qerarê kirine ya xwe û zehf nimînendeyên civatmiletê brîtanî, di vê pirsê de xwe gihandine wezîrê brîtanî ê yekemîn. Lê hawîrên diplomasî ên biyanî, carna dibihîsin ko hin nimînendeyên yekîtiya Xebatkerên Brîtanî dixwazin elemanên nazî û no—nazî ji hev veqetînin û bi girtina qedra elemanên no—nazî dema hilweşandina naziyan bilezînin.

Li gora hawîrên payetextê Brîtanya Mezin ev tişt bi talukeyine dijwar girêdayîye û bivêneve pê çavê miletên ko ev çend sal in, di destê elemana de êşiyane. wê bêne tirsandin. Hawîrên Brîtanî her çend jî, li ser pirsa ji hev kirina talyana bi navê fesîst û no—fesîst bi awakî nermtir dipeyivin, her hal dibêjin ko di vî tiştî de jî giranî li cih e. Divê neyê ji bîr kirin ko talyanên no—fesîst, ji qeneve sînorên Italyayê yên sala 1918—an wê bixwazin û ev pirs bi serê xwe, tiştekî zirav û giraneye; ji ber ko li gora Yugoslava pereçeyek erdê Yugoslavî di destê talyana de ye û çavê wan lê ye. Her wekî rojekê hikûmeta Çang—Key—Çekî dikare bixwaze bibe mîratxwerê hemî imtiyazên ko hatine dayîn hikûmeta Nankînê. Ji ber vê yekê heta ko teşxeleyin çenebin, ji bona ingilîz û emerîkaniya rê û debara çêtir ev e ko ev pirsên he, ne bitenê bi tevkariya Ûrisa, lêbelê bi tevkariya Frense, Yugoslavya, Yewnanistan, Holende,Belçîke û Çekoslovakyayê bêne safî kirin.

### ITALYANINO RABIN

BANGÎNA SEREKCIUMHÛR RÛZWELT Û MR.ÇORCIL

WEŞINGTON—Serekcimhûr Rûzwelt û Mr. Çorcil bangîna jêrîn şiyandine talyana: Bi xurtî li elemana xin. Wext hatiye û divê hon xwe pêk bînin da ko silh, aştî û azahî bibe heqê we. Armanca pêşîn paqijkirina erdê Italyayê ji elemana ye. Hitler bi destê hevalkarê xwe Musolînî hon xistin perîşaniyê, û talyan di nav sêlakên Misrê û berfên Rûsyayê de hatine kuştin. Elemana di qadên şerî de tim û daim bêbextî li talyana kirine, wan talyan dixistin pêşiyê û pê karê xwe ê bişûndekişandina eskerên xwe pêk dianîn, Niho jî Hitler dil dike bi wasite talyana dema perîşanî û kambaxiya xve bi dûr xe û Elemana haziriya xwe kirine û dixwazin we jî mina xelkên welatên din ên vegirtî bifetisînin.

Li elemana rabin, destê xwe bavêjin çekê xwe û di tenişta Hevalbendan de, di tenişta dostên xwe brîtanî û emerîkaniyan de, ji bona serbestiya xwe pêş ve bimeşin.

## DÛRIK

DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRÊ

### NOFA

Dêra Zorê yekban e
Krasê Nofa kitan e
Memik 'tê re xuya ne
Yek deştê, yek zozan e.
Dêra Zorê bi dikan e
Memkên Nofa fincan e
L' serê sûk û dikana
Dêka Nofa file ye .
Bavê wê misilman e.
Dêra Zorê mezin e
Destê Nofa b'bazin e
Par qîz bû îsal jin e
Hena l'ser dest û bazin e.
Dêra zorê biçûk e
Par qîz bû îsal bûk e
Hena l'ser dest û nenûk e
Lê,lê,lê,lê Nofanê.
Endîwerê paytext e
Ka kevoka l'ser text e
Kanî xortê di rext de
Ka soz û ka te bext e.
Nisêbînê giş jin in
Keçên Stilî xweşik in
Diyarbekrî ticar in
Meskenê dost û yar in.
Memik behra xortan e
Memik l'gewrê gihane
Wek fincanê fexfûrî
L'serê sûk û dikana.

### AZE

Aze yi, tu Aze yî
Weleh, bileh tu Aze yî
Kûçik tu pir fitne yî
Fitneyê gundê me yî.
Aze tu bavê Madiyê
Te rahişt tûrê parseyê
T'daket binya xetê yê
T'sed olçek micbî kirin.
T' destê xwe xist çalê yê
T' berê xwe da Nisêbînê
Baş—çawişê Stelîlê
B' çavê serê xwe dibînê
Destê Azê b'kelemça dixînê
Berî didin Mêrdînê.
Nûrê radibe dilezînê
Hebana derewa
Bi xwe re hiltînê
L'Midyatê direşînê.
Aze çû bû Diyarbekir
Serbarê Azê şekir
Beqala l'hev zêde kir.
Qesra Azê du kulek
Jê firya bûn du ordek
Tu l' riha Azê binêr
Wek teriya kuç'kê belek.
Qesra Azê du qozî
Jê fir'ya bûn du horî.
Tu l'xweha Azê binêr
Weke gîska hat ber nêrî.

### XURFANÊ

Doy, doy, Xurfanê.!!.
Xirbê Qeplo bilindcê,
Kurika Çeto Altincê,
Dimsfiroş in Kermêtî,
Şkêft pir têde Kersivanî,
Serê diyar de T'afî
Kundê şkêra Zihnî
Du bîr têde Mercî.
Hatim aliyê vî alî
Qamkutik in j'xwey Golî
Ardê cehê Metînî
J'bo gelaciyê Biyêrtî
J'xewa şevê ra Merzikî
Gundê mezin Mehsertî
Çîm werqilê di Qelaçî
Keçkê di xweşik Ziyaretê.
Ez hatim aliyê vî alî
Serê diyêr de Êdwî
Ser bi ribê Rişmilî
Hek tu l'jinê çê digerî
Dakev tixûba Rengî.
Jinê d'bî xwedî sêwî
Xwediyê ta'b û sêfilî
Mi heft sala Şivanî
Û m'heft sala gavanî
Nanê heqê jinik bî.

# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞÎTIYÊ

## EVE EMERÎKE

Piraniya mêrên Emerîkayê, ji bona bi xwedî kirina jîn û zaroyên xwe bi karekî mijûl dibin. Jin li mal dimînin û îşên malê, îşê zaroan, terbiye kirina wan karê jinay e.

Lê barê jinan ji yên mêra ne siviktir e.

Jinkê divê ji bona rahetî û kamiraniya mêrê xwe, bala xwe bide paqijî, spehîtî û tertîba malê, wê divê bi terbiya zaroa mijûl bibe da ko zaro, sibe bibin jin û û nivîsandinê hez dikin, qedrê zanîn û dibistanê digirin.

Emerîkanî sedî de not û pênc xwendin û nivîsandinê dizanin, welat, milet, istiqlal, heq, azahî, serbestî qîmeta jiyînê çiye nas dikin, û yên ko ev tiştên he xweş nas ne kirine, herwekî dixwînin, ji kitêban van tişta dielimin.

Asasa malê dê ye, û diyên nezan reben in, nikarin çavê zaroyên xwe vekin û eşqa zanîn, me



mêrên qenc, xwedî ilm û bikêrhatî, ji ber vê yekê keçên Emerîkayê mîna lawên wî welatî 8 û heta 10 salan di dibistanan de dixwînin û ji zanînên adetî mîna zman, dîrok, hisab, hendese, erdnigarî-coxrafiyê pêve, hînî drûnkerî, dermankirina nesaxiya zaroan û gerandina karên malê dibin.

Her wekî ilm û hiner her tiştî, her xebatê siviktir dike, jinên emerîkanî di saya zanîn û hinerweriya xwe de, zehf îşên xwe bi mekînan diqedînin, di bin barê zinahî, heq û serbestiyê bêxin dilê law û keçên xwe..

Zaroyên Emerîkayê ên belengaz jî, bi arîkariya dewlemendan û bi arîkariya camêran dikevin dibistanên mezin û gelek caran tête dîtin ko kurê şivan, cotkar, pale an xebatkarekê şehadeyine mezin distînin, dibin diktor; abûkat, mihendiz, zabit, hakim wezîr û serekcimhûr.

Dê û bavê Emerîkanî nan û xwarina xwe kêm dikin, lê tucara kurê xwe ji dibistanê bi şûnda na



giraniya xebatê de, westa na kevin, û ne bitenê bi karên malê, lêbelê bi xwendîn û pêşveçûna zaroyên xwe mijûl dibin, dersa wan dibêjin. Dibistana Zaroan a pêşîn di Emerîkayê de mal e, û seyda û mamosteyê ewil dê ye.

Zaro hêj biçûkahiya xwe de bala xwe didin paqijiya dest û rû û dev û diranên xwe, cilên xwe, textên xwe; ji kitêb, ji xwendin hêlin.

Xelkê gundekî digehin hev û ji zaroyên gund xortekî hêja dibijêrîn û bi pereyên xwe wî dişînin dibistaneke mezin; piştî 8-10 salan ev xort dibe diktor an zabitek û vedigere gundê xwe.

Xelkê gund bi vî tiştî ecêb şa dibin û ev xortê xwenda û zana bi kêrî xelkê gund û bi kêrî hemî welatiyên xwe tê.

www.arsivakurdi.org

1ère ANNEE LUNDI 20 SEPTEMBRE 1943 NUMERO 21

# LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## Vers la Victoire

### CHRONIQUE HEBDOMADAIRE DE LA GUERRE

A bout d'imagination, le grand Fuhrer nous a offert cette semaine un intermède réussi dans le genre Opéra - bouffe : l'enlèvement de Mussolini et sa présentation au monde sous la nouvelle étiquette de «fascisme républicain».

Pas plus que nous, Hitler n'est dupe de la propagande que sa radio essaie de monter autour de l'ombre de son acolyte. Mais Hitler en est réduit maintenant à exploiter les moindres faits—divers et à en tirer des bulletins de victoire à l'usage du peuple allemand: ce compte - rendu des trois journées de la bataille de Salerne pendant lesquelles l'armée de Kesselring très favorablement placée a pu gêner les opérations de la 5ème armée américaine qui venait de débarquer et un moment la menacer, en est encore une preuve. Mais pas plus qu'Hitler le peuple allemand n'est dupe de cette propagande.

FRONT D'ITALIE—

La Méditérranée toute entière est ouverte aux flottes alliées, depuis que la flotte italienne, que l'on a enfin vue, goûte un repos moral bien gagné à Malte ou en Egypte. La ligne qui va de Salerne à Bari est solidement tenue par les armées alliées. Gagliari et les aérodromes de Sardaigne ont été évacués par les Allemands. Et l'occupation de la côte Dalmate par les patriotes Yougoslaves, donne un poids nouveau et précis à la menace sur les Balkans.

FRONT DE RUSSIE

C'est toujours la grande débacle des armées allemandes. Du sud au nord la situation se présente ainsi: après un ultime assaut, le très important port de guerre de la mer noire, Novorossisk est occupé par les Russes qui d'autre part accentuent leur pression dans la presqu' île de Taman. Avec la prise de Mariopol et de Berdiansk, et l'avance qui continue sur la rive Nord de la Mer d'Azov, la position allemande en Crimée commence à être précaire.

Tout le cours inférieur du Dniepr jusqu'à Kiev est immédiatement menacé par la chute de la dernière forte ligne de résistance appuyée sur Pavlograd (qui est à 50 kilomètres de Dniepropetrovsk) Krasnograd, Priluki et entre ces 2 villes, sur Poltava dont la prise est imminente.

Kiev elle - même est en grand danger, et un dernier ordre du jour de Staline annonçait que les défenses de Smolensk étaient enfoncées.

FRONT DU PACIFIQUE

Après l'occupation de Salamawa, Lae vient d'être évacuée par les Japonais, en Nouvelle Guinée.

La bataille pour les lignes de communication se développe favorablement dans ce secteur. D.

## LA FRANCE REPREND SA PLACE PARMI LES NATIONS

Dans le message qu'il vient d'adresser au peuple américain, Cordell Hull, Ministre des Affaires Etrangères du Président Roosevelt dit: «L'Amérique sait qu'avant peu, la puissance militaire française sera rétablie. Elle s'attend à ce que la France, relevée, prenne sa place dans le concert des Nations Libres. Certes, la France aura un rôle à jouer dans l'organisation internationale de l'après—guerre. Ce rôle, elle le jouera aux côtés de la Grande Bretagne, des Etats-Unis, de la Russie et de la Chine, avec l'égalité des droits et toute l'autorité d'une grande nation.»

Certes, nous puisions, dans la victoire, dans les épreuves, et jusque dans nos malheurs un sens assez profond de la grandeur de la France, pour ne pas douter de son rang dans le concert des vainqueurs.

Mais le principe établi par Cordell Hull autorise le Comité National de la Libération Française, dirigeant l'effort français dans la guerre, donc comptable des droits de la Patrie, à être dorénavant non seulement informé, mais écouté, quand il s'agit de prendre une décision pour le présent, qui engage l'avenir.

Il y a 3 ans, les établissements français du Pacifique, suivant l'appel du général De Gaulle, entraient dans la voie du devoir, c'est-à-dire dans la guerre.

L'importance de cette décision a été appréciée par l'écrivain américain Walter Lipmann, dans le livre lumineux qu'il a consacré à la politique extérieure des Etats-Unis, en ces termes:

«Que serions-nous devenus, si non seulement la Chine, la Grande Bretagne, et l'Australie, mais encore la Hollande et la France Combattante étaient restées neutres dans une guerre entre le Japon et l'Amérique. Toutes les campagnes dirigées contre le Japon dans le Pacifique sud sont parties de bases britanniques et françaises.

Faut -il rappeler que les hommes du bataillon «Pacifique», pour la plupart des volontaires de Nouméa, ont joué leur part pour défendre contre l'assaut de Rommel, les terres de Moyen-Orient?

Faut-il rappeler que leur Chef, le Colonel Broche, repose sous le tertre glorieux de Bir Hakim. Serments de Bir—Hakim, voilà un des titres de la France à l'égalité des droits et à toute l'autorité d'une grande nation.

Au G.Q.G. de Londre, l'Amiral Stark et le général Devers viennent de décorer le général Macquenet, Chef de la Mission Militaire Française en Grande Bretagne. Sur le front tunisien, ce général fut le premier général français depuis 1940, qui a eu l'honneur de recevoir la reddition d'nne division allemande tout entière, avec son Etat-Major Le 2ème décoré fut le lieutenant de Vaisseau Bergeret, Capitaine du bateau «Rose - Lys», qui a sauvé au large de l'Islande, 170 marins américains dont le bateau avait coulé en heurtant une mine. Les combattants et les morts de la France, dans les batailles de l'Afrique et de l'Atlantique, voilà un des titres de la France à l'égalité des droits et à toute l'autorité d'une grande nation.

Sur le front russe, l'escadrille de chasse «Normandie» vient d'abattre en un seul jour, 21 avions allemands. Depuis le printemps dernier, cette escadrille a à son actif plus de 60 victoires certaines sans compter les probables.

Cette association de l'héroisme et du sang versé par les Français et par les Russes, voilà un des titres de la France à l'égalité des droits et à toute l'autorité d'une grande nation.

Et puis ces paysans, ces ouvriers, ces bourgeois, frémissant sous la botte de l'ennemi et des collaborateurs, ces mères qui voient dépérir de faim leurs enfants, ces garçons déportés pour le travail forcé; ces patriotes emmenés dans les prisons et les camps de concentration, tous ceux et toutes celles qui ne cessent de nuire à l'Allemand sur notre sol et sur le sien; tous ceux et toutes celles qui n'ont qu'une pensée, une espérance, une certitude : que l'idéal pour lequel ils combattent l'emportera sans contrefaçon, comme le général De Gaulle avait raison de les associer, dans son discours d'Oran, aux combattants, pour leur donner leur part de gloire dans la grande bataille. En leur nom, en votre nom à vous tous il s'est écrié, «Le véritable réalisme, c'est de ne pas les décevoir.»

## POEME MODERNE TCHECOSLOVAQUE

### LA RUE

Par JOSEPH HORA

Vide entre ses maisons,
La rue est tâtonnante,
Sans pas, sans voix
Qui se déchire aux murs
En se heurtant
Contre leurs angles durs,
Ni qui vous ensanglante.

Des pas, des voix,
Par le silence vont pourtant;
Souffles sans corps, les ondes
De ceux qui ont passé
Par mon visage passent,
Et coulant de leur bouche,
A ma bouche se fonde
L'azur de mai,
Les grâces de septembre.
Et des ombres aux vitres claires
Font du gris.

Ils allaient sans s'en aller
Et aucun d'eux n'est parti,
En nous les rires d'enfants
Se sont endormis:
La faim des yeux étrangers
Glisse entre nos tempes
Son ombre, qui s'éteint en nous,
Comme une lampe.

Et des mains sur son sein,
Tant de mains jettent
Des lueurs!
Et il tombe tant de fleurs
Sur ma tête,
Tant de fleurs!

*Josef / lire: Yosêf / Hora / né 1891 / a gagné sa renommée littéraire après la première guerre mondiale. Dans la poésie tchèque, c' était là la période d'un désir ardent de la fraternité et de l'égalité.*

*Josef / lire : Yosêf / Hora est souvent décrit comme le plus important poète contemporain tchèque.*

## APRES DEUX ANNEES DE COMBATS SUR LE FRONT DE RUSSIE

*Dans son dernier discours, Hitler n'a pas dit grand chose sur le front Oriental. Il n'a prononcé qu'une phrase qui s'y rapporte: «la nécessité nous force parfois reculer sur tel ou tel front».*

*Depuis le début de l'offensive d'été russe, les Allemands ont abandonné 165.000 km. carrés, un territoire deux fois plus grand que l'Autriche-*

*Le «Voelkischer Beobachter» déclare le 6 Septembre: «L'espace n'est plus l'ennemi-mais l'allié des armées allemandes qui sont maintenant sur la défensive».*

*Mais l'allemagne n'a-t-elle perdu que du terrain ? Non. Dernièrement, les canons ont retenti souvent à Moscou, pour fêter des victoire : Orel, Bielgorod, Soumi Stalino. Konotop, Neljin, Novorosisk, et nous en passons.*

*Orel, Bielgorod, Slavian, Taganrog, elnya étaient les piliers principaux du système de défense allemande, les fameuses «positions hérissons» dont la propagande allemande avait affirmé qu'étaient iuvulnérables. Mais les hérissons ont eu leurs piquants rompus par l'ours russe».*

*Dans les communiqués du Haut-Commandement allemand, le terme «hérisson» fut remplacé par le «stratégie élastique.*

*Est-ce là tout? Que non. Les villes reprises n'étaient pas seulement importantes du point de vue stratégique mais également du point de vue industrielle Kharkov est la plus grande ville industrielle de l'Ukraine. Taganrog plus grand sur Stettin, est le plus grand port industriel de cette région-Souvent, la propagande allemande avait appelé le Bassin de Donetz, la Ruhr soviétique». En effet, ce fut la région qui fournissait tout le charbon aux civils et aux militaires de Russie. Aujourd'hui les Russes ayant repris cette région. le charbons pour les trains militaires allemands doit être importé de la Haute—Silésie.*

*Depuis 2 ans des trains par milliers avaient amené d'Allemagne des machines à Kharkov, Stalino. et dans le Bassin du Don. pour remettre en marche les mines et les ascieries détruits par les Russes. Selon les données de la radio allemande, les instruments eagricoles suivants furent ennoyés d'Allemagne en Russie dans la seule année de 1941 : un million de feucilles; 22.000 charrues, 2.700 faucheuses, 3.000 batteuses; 1000 fracteurs. D'autre part, le bétail suivant fut amené d'Allemagne : 100.000 porcins, 180.000 bovines, sans parler de leur fourrage. Comme semaille, pour la seule année de 1941 : 50.000 tonnes.*

*Toutes ces choses sont déjà perdues ou sur le point de l'être.*

*Est-ce là tout? Que non. Briansk en tant que centre ferroviaire. est plus important que Smolensk; Kharkov en tant que noeud routier et ferroviaire, est plus important que Kiev. Quand l'Armée Rouge déclencha sa dernière offensive d'hiver, elle partait de régions presque dénuées de voies ferrées. Les divisions russes furent concentrées entre la Volga et le Don, c'est de là qu'elles partirent pour anéantir l'Armée de Paulus à Stalingrad, pour dégager le Caucase et pour reprendre Rostov.*

*Mais quand l'Armée Rouge, declenchera sa prochaine offensive d'hiver, elle partira d'une région possédant le meilleur réseau ferroviaire de la Russie; de soumi au Donetz; de Kharkov à Orel et Briansk, et delà jusqu'à Léningrad, le pays possède d'excellentes communications.*

*L'offensive actuelle n'est que la préparation stratégique du coup décisif qui sera porté en hiver. L'offensive actuelle ne fait qu'assurer ses positions de départ, ne fait que détruire systématiquement toutes les positions de défense allemandes, ne fait qu'exploiter la faiblaisse stratégique des Allemands qui résulte de leur manque de réserves.*

*Le Hant—Commandement allemand ne possède plus assez de troupes pour tenir le front sur toute sa longueur. Voilà pourquoi l'Armée Rouge peut attaquer, un jour sur tel point, le lendemain sur tel autre : dans les secteurs de Smolensk, et dans le secteur de Poltava, dans la région de Roslavl ou dans celle de la Mer d'Azov; et chacune de ces villes peut devenir un nouveau Stalingrad.*

*Kharkov. Stalino, Taganrog, Briansk et Novorosisk ne sont que les préparatifs pour les coups décisifs qui seront porté en hiver.*

www.arsivakurd.org

# DI PESIFIKÊ DE

## Dora 20.000 Eskerên Japonî Hatine Girtin

MELBURN—R: Qerargeha Hevalbenda a mezin di Pesîfîka nîro—roavayî de elam dide: Eskerên emerîkanî yên ko ji balafiran bi sihva na daketine erdê piştçeperên japona, rex nevala Marxamê ve, pêşve çûne û niho zora xwe didin Salamuayê—erdê Nû-Gîneyê. — Dora ye kîneyên firqeya japonî 4, hemî bi hevre 20.000 şerevanî hatine girtin Êdî cebilxane û zad û xwarin nikare bigehe wan.

# DI NAV 4 MEHAN DE

## Xesarine Giran Gihane Qiwetên Elemana

MOSKÛ— Bi awakî resmî didin zanîn: Ji pêncê tîrmehê û heta pêncê îlonê 1943-an, leşkerên sovyetî di eniyên şerî de 4.729 balafir; 4.000 tang, 5.192 top, 28.000 otomobîl û kemyonên elemanî xira kirine 420.000 kuştiyên elemanî li erdê mane. Ji 5 ê tîrmehê û heta 5-ê îlonê 1.500.000 eskerên elemanî ji qiwet ketine. Ûrisa 1.041 tang û 2.018 top standine û 38.600 hêsîr girtine.

# EMÊ GAZÊ

Wey la wayê, wey la de wayê.

Bişarê Çeto bankir Emo lawo were rayê, eskerê romî û nefîrama qaymaqamê Zoqê, û nefîr ama bîst û çar eşîra giran e, bi kuştinê dawî nayê.

Emo bankir, Bişaro lawo, şa hîdê bavê Şemso gelek hene, bi êrîşa ewilî, mi gelek zabit û onbaşî û çawîş kuştin, meytê wan avêtin, bendê reza, serê wan kirin loda xwe a kayê.

De lêda!...talî Emo de lêda, pozberano de lêda;

Emo bankir, Bişaro lawo, nigê mi di qeydê da, mifta qeydê li cem Şemso Xanimê, li asrax û banê qesrê da, dilê mi dilekî li dîn e.

Şemso bankir: kekê Cemîlê mêzeke, birek malê koçera, li Zîwkanê Saço,li sadeka bavê Melko, li kevrê bûk û zava, li teniştа malê me danîne. Ez bala xwe didimê, sibe ye, pênc swar tên û dilezînin, siwarê pêşî Mehemedê derwêş e, yek jê Elîkê Elîkawî ye, yek jê Mecîdê Segman e, yek Xalidê Xwedê daye, ê dawiyê Êliyê Matkî ye.

Bi texmîn vê sê bi ser koza lawê gazê da dica'dînin, tirsam tê, ji wê tirsê, wê koza lawê gazikê, Kozika Karanê, wê bikin qitîtk û xwîn e-

Şemso bankir Hesenê Osman bavê min vê, sê tu mêr be, devê, canfidayê li şibak û li banê qesrê xîne.

Bike tu van her pênc siwara, ji ser koza Emê Gazê vegerîne.

Şemso bankir, Cemîlê, sibe bû, bira şerek çêneba, li Kelekanê Koçera, li pozê Bîra, bi bîr e, mi dî ji êvara Xwedê da dengê top û tekelikê Bişarê Çeto, qaymaqamê Zoqê, ji êvara Xwedê da, li ser serê Emê Gazê, nala çûçikê ser hêlîna wîlê wîl e.

Şemso bankir, Hesenê Osman, kurê xalê îro derba bavê Cemîlê, sibe bû, dilê mi, dilekî li dîn e.

Bişarê Çeto bankir, Mehemedê Dewrêş bavê mi tu çawa ye, tu îro bi ser koza Emê Gazê da, bikudîne, tu enextara mîryê ji destê wî bi derxîne.

Mehemedê Dewrêş bankir, Bişaro lawo, ma damkî te ez xwestim, sekna mi tu nîne,

Henê bankir! cewê, cewê bankir, seyrê, seyrê bankir, Mehemedo lawo îşê te bi îşê Emê Gazê û Bişarê Çeto tu nîne, Emê Gazê wê te bikuje heyfa dijminiya kîna kevin wê bi serê te derxîne. Mehemedê Dewrêş bankir: seyrê lê dayê; heger ez najom ser koza Emê Gazê, Bişarê Çeto û Mecîdê Segman û Emerê Perîxanê, wê li Kozê Xanimê xwe rûnin, wê xwe li cem jinê xwe, xwe bi pesinînin, wê laf û forta li kurê te bikişînin, Bişarê Çeto wê bibêje:

Min Mehemedê Dewrêş li Emê Gazê elimand,, nikanî bû Emo bi kuşta û enextara romê ji ber hilîne,

Ezê vê sê bi ser koza Emê Gazê da, ezê bikudînim, qedera çi hebê, wê serê xwe bibîne.

Semso bankir Cemîlê hekê sibe bû, bra şerek çêneba li Zewkanê, saço li sadeka, bavê Melko li çardaxa bavê şebûkê li Kevrê Bûkan û Zava, sibe bû dengê top û tekelikê Bişarê Çeto û qaymaqamê Zoqê ji êvara Xwedê da, li ser serê Emê Gazê tê; nala girgira ewran û tava.....

Bişewite mala qaymaqamê Zoqê, Bişarê Çeto û Mehemedê Dewrêş, lawo te malik ne ava, te hacûm kire ser koza Emê Gazê, we kuştin Emê Gazê, birîna Emê Gazê li nabeyna her du çava. Ba Xems bişewite, bi newal e.

Şemso bankir: Cemîlê hekê ez bala xwe didimê, vê sê şerê aliyê Emê Gazê (Gêrra Bênderê) Kozika Karanê şer sehabe ji nîro bi şûnda, şer qulibî ser banê qesrê Kela, ba Xemsê, ser milê Hesenê, Osman kurê xalê Kewê bi kar e.

Dilê mi dilekî li dîn e; şemso bankir: Hesenê Osman mêzeke Mehemedê Dewrês û Xalidê Xwedê dayî, Eliyê Elikawî, Emê Gazê kuştin dikin enextara romê ji dest derxînin.

Bavê mi tu mêr be, devê kuçûk çapiliyê li şibaka jorîn xînê bi ke tu qapaxa qafê Mehemedê Dewrêş bi firîne.

Heyfa Emê Gazê Hefadê kela ba Xemsê jê hilîne.

Hesen bankir şemso: xwarzê enextar di destê kurê xalê te da germ bûye, ez kêm digirim zêde dixîne, tu balçîqa dev zirav bi destê kurê xalê xwe gihîne, gava şemsa dike û dilezîne paniya qunderê hildikşîne balçîqa dev zirav li cem Hesenê Osman datîne. Hesenê Osman bankir şemso! tu îjarê derbê kurê xalê xwe bi çavê serê xwe bibîne, gava Hesenê Osman deste li balçîka dev zirav dixîne li bejna Mehemedê Dewrêş diedilîne, qapaxa qafê Mehemedê Dewrêş difirîne, doxîna şelwerê Eliyê Elîkawî duqusîne. Heyfa Emê Gazê, bavê şemso, Hefadê kela Baxemsê jê hiltîne.

EBDILHADÎ MIHEMED

# PÊJINÊN DINYAYÊ

## CENG & RAHETI



Ji Bergehên Treblisxerbê.



Bajarê Rûsî ê Egîd Stalîngrad, Kûçe û Kolanên Xwe De Zora Dijminan Biri Bû. Çeper û Kozikên Dora Stalîngradê.



Leşkerên Rûsî Ji Bono Şerê Zivistanê Xwe Pêk Anîne.



Kewte û Sedmêrên Ordiya Sor, Bi şev Karê Xwe ê Dîdevanî û Nobetdariyê Pêk Tînin.

IMPRIMERIE DU JOURNAL LE MIROIR D'ORIENT

www.arsivakurdi.org